

Mirov Kêmasiyên Xwe Bibîne

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا عَلَيْكُمْ أَنْفُسَكُمْ لَا يَضُرُّكُمْ مَنْ ضَلَّ إِذَا اهْتَدَيْتُمْ

“Ey kesên ku îman anîne! Hûn li xwe binêrin û xwe rast bikin. Dema hûn li ser rêya rast bin, kesên ku ji rê derketine nikarin zirarê bidin we.” (Maîde, 105)

طُوبَى لِمَنْ شَغَلَهُ عَيْبُهُ عَنْ عُيُوبِ النَّاسِ

“Mizgînî ji wan kesan re ku bi kêmasiyên xwe re mijûl dibin û fersendê nabînin ku li xeletiyên kesên din bigerin.” (Beyhakî, Şuabu'l-Îman, 13/142)

Birayên Misilman ên hêja!

Mijara xutbeya me ya îro “**Mirov Kêmasiyên Xwe Bibîne**” ye.

Em wek mirovan di vê dinyayê de bi xeletî û kêmasiyên xwe re dijîn. Ji ber vê yekê, dibe ku em bikevin xefikên nefsa xwe û şeytan û xeletiyên bikin. Lê ya girîng ew e ku em xeletî û kêmasiyên xwe bibînin û ji bo rastkirina wan hewl bidin. Çimkî heta em kêmasiyên xwe nas nekin, em nikarin xwe ji wan rizgar bikin. Yek ji mezintirîn nimetên Allah ji bo mirovekî ew e ku Allah kêmasî û xeletiyên wî nîşanî wî bide.

Dîtina kêmasiyên xwe, gava yekem a rastkirina wan e. Ji ber vê yekê, divê em bizanin ka bi çi rêyan dikarin kêmasiyên xwe bibînin.

Pêşî, divê em vegerin ser çavkaniyên dînê xwe. Qur'ana Kerîm û Suneta Pêxemberê me, çavkaniyên bingeîn in ku rêya rast nîşanî me didin. Divê em ji wan fêr bibin ka dînê me çi ferman dike û ji çi tiştan me qedexe dike. Divê em helal û heram ji hev cuda bikin. Ji bo vê yekê, divê em pirtûkên ilmîhalê û exlaqê bixwînin.

Bi xwendina van pirtûkan em dikarin helal û heraman, kirinên baş û xerab û tiştên ku mirovan ber bi felaketê ve dibin, fêr bibin.

Rêyek din a naskirina kêmasiyên me ew e ku em li ser halê xwe bifikirin û xwe bipirsin. Mirovê ku bi xwe re rû bi rû nabe û xwe hesaba nake, her tim sûc û kêmasiyê li dervê xwe digere. Ew xeletiyên xwe nabîne. Ji ber vê yekê jî ne dikare sedema rast bibîne, ne jî dikare xwe ji kêmasiyên xwe rizgar bike.

Lê mirovek ku li xwe vedigere û dibêje: “Min çi xeletî kir ku, her tişt baş diçû, lê em bi vê pirsgerê re rû bi rû man?” ew xwe dipirse û xeletiya xwe digere. Bi destûr û alîkariya Allah, mirovekî wisa dikare astengiyên li pêşiya xwe derbas bike û di karên xwe de serkeftî bibe.

Berî ku em bîr hesaba kirin, divê em xwe hesaba bikin. Divê em bizanin ku carinan di nav karên me yên baş de jî dikarin niyet û fikirên nebaş hebin. Ji ber vê yekê divê em her tim berê xwe bidin Cenabê Hakk.

Rêyek din jî ew e ku em hevalên dilsoz û rastgo peyda bikin. Hevalên ku xeletiyên me ji me re bibêjin, me hişyar bikin û dîsa me ber bi rêya rast ve bibin.

Her çend Pêxemberê me (sallallahu aleyhi ve sellem) pêdiviya wî bi vê yekê tunebû jî, Cebraîl aleyhisselam hevalê wî bû. Herwiha di nav sehabe yên hêja de jî hevaltî û biratiyek xurt hebû. Wan xeletî û kêmasiyên hev ji hev re digotin. Resûlê Ekrem (aleyhi's-salâtü ve's-selâm) sehabe bi hev re kiribûn bira. Bira alîkariya birayê xwe dikir û piştgirî dida wî.

Wan tenê di karên dinyayê de alîkariya hev nedikir. Ji bo axiretê jî alîkariya hev dikirin. Qencî nîşanî hev didan û xeletî û kêmasiyên hev bi bîr dianîn.

Hazretî Omer dema bi Selmanê Farisî re dicivî, jê dipirsî ka kêmasiyek wî heye yan na. Herwiha Hazretî Omer ji Hazretî Huzeyfe re digot: “Resûlê Ekrem navên munafîqan yek bi yek ji te re

gotiye. Ji bo Allah ji min re bêje, gelo ez jî di nav wan de me?”

Birayên hêja!

Mijareke din a girîng jî ew e ku mirov gunehê xwe ji bîr neke. Bîranîna gunehê xwe bi xem û poşmanî, dikare bibe sedem ku mirov careke din nekeve heman xeletiyê.

Ger mirovek ketibe gunehêkê, divê bêtî ku wextê xwe winda bike, bi tewbe vegere Allah. Divê ji gunehê xwe poşman bibe û nefsa xwe her tim hesaba bike. Ev poşmanî û tewbe dikare bibe sedema paqijkirina gunehê wî. Heta dibe ku Allah ji ber vê poşmanî û vegera wî, sevabê jî bide wî. Yanî mirovek ji gunehê xwe poşman dibe, dîsa berê xwe dide Allah û ji bo gunehê berê careke din tewbe dike.

Muminên hêja!

Di nav sedsalan de gelek alim li ser vê yekê rawestiyane ku mirov çawa dikare kêmasiyên xwe nas bike. Wan ji bo vê yekê rê û rêbazên cuda nîşan dane. Çimkî mirovek ku kêmasiyên xwe nabîne, dikare gelek tiştan winda bike. Xerabbûna mirovekî ne tenê zirarê dide wî. Ew dikare zirarê bide malbata wî, derdora wî û civakê jî.

Ji ber vê yekê, rû bi rû mayîna mirov bi kêmasiyên xwe re, gaveke pir girîng e. Ev gav dikare hem li dinyayê û hem jî li axiretê bibe rêya aramî û rizgariyê.

Mirovê ku her tim bi kêmasî û aybên kesên din re mijûl dibe, di dawiyê de kêmasiyên xwe nabîne. Kesê ku her tim kesên din sûcdar dike, li xeletiyên xwe nanêre û her tim tiliyê xwe ber bi kesên din ve dike.

Pêxemberê me (aleyhissalâtü vesselâm) li ser kesê ku her tim dibêje: “Ev xerab e, ew xerab e, yê din jî xerab e,” bi vê maneyê hişyarî daye:

“Kesê ku dibêje: ‘Mirov hemû helak bûne’, ew bi xwe herî zêde di helakê de ye.”

Mirov carinan bêtî ku hay jê hebe, dest bi şermezarkirin û aybkirina kesên din dike. Lê dibe ku piştî heman tişt were serê wî.

Resûlullah (aleyhissalâtü vesselâm) dibêje:

مَنْ عَيَّرَ أَخَاهُ يَذَنْبٍ لَمْ يَمُتْ حَتَّى يَعْمَلَهُ

“Kesê ku birayê xwe yê mumin ji ber gunehêkî şermezar bike, berî ku ew jî bi heman tiştî were ceribandin, namire.”

Dibe ku ev tişt rasterast were serê wî. Dibe ku di malbata wî de, li ser zarokên wî, hevjinên wî an kesekî nêzikî wî derkeve holê. Ji ber vê yekê, divê em ji aybkirin û şermezarkirina mirovan dûr bisekinin.

Li şûna ku em gunehên mirovan êşkere bikin, divê em wan ber bi tewbe û îstîxfarê ve bibin.

Li ser Hazretî Mûsa (aleyhisselam) bûyerek tê vegotin. Hazretî Mûsa bi civata xwe re çend caran derdikeve duaya baranê, lê baran nabare. Piştî Hazretî Mûsa destên xwe radike û dibêje:

“Ya Rebî! Te ferman kir û ez jî derketim duaya baranê. Lê baran nabare.”

Allah Teala dibêje ku di nav civatê de kesên gunehkar hene û ji ber wan baran nayê şandin. Hazretî Mûsa dipirse ka ew kes kî ne. Lê Allah Teala bi vê maneyê dibêje:

“Ez gunehê bendeyê xwe êşkere nakim. Hûn hemû tewbe bikin. Bi vî awayî ew kes jî di nav we de tewbe bikin û Ez ê duaya we qebûl bikim.”

Di rewşên wisa de, ya ku divê were kirin ew e ku em hemû bi hev re tewbe û îstîxfar bikin. Allah ayb û gunehên bendeyên xwe êşkere nake. Erkê me jî ew e ku em hewl bidin vê exlaqê di jiyana xwe de nîşan bidin.

Mirov Kêmasiyên Xwe Bibîne

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا عَلَيْكُمْ أَنْفُسَكُمْ لَا تَضُرُّكُمْ مَنْ ضَلَّ إِذَا اهْتَدَيْتُمْ

“Ey kesên ku îman anîne! Hûn li xwe binêrin û xwe rast bikin. Dema hûn li ser rêya rast bin, kesên ku ji rê derketine nikarin zirarê bidin we.”

(Maîde, 105)

طُوبَى لِمَنْ شَغَلَهُ عَيْبُهُ عَنْ غُيُوبِ النَّاسِ

“Mizgînî ji wan kesan re ku bi kêmasiyên xwe re mijûl dibin û fersendê nabînin ku li xeletiyên kesên din bigerin.” (Beyhakî, Şuabu’l-Îman, 13/142)

Birayên Misilman ên hêja!

Mijara xutbeya me ya îro **dîtina kêmasiyên xwe ye.**

Em mirov in û em dikarin xeletiyên bikin. Lê ya girîng ew e ku em xeletî û kêmasiyên xwe bibînin û ji bo rastkirina wan hewl bidin. Çimkî heta em kêmasiyên xwe nas nekin, em nikarin wan rast bikin.

Ji bo vê yekê divê em Qur’an û Sunetê baş nas bikin, helal û haram fêr bibin û her tim xwe hesaba bikin. Li şûna ku em sûc li kesên din bigerin, divê em ji xwe bipirsîn: **“Gelo xeletiya min çi ye?”**

Herwiha hevalên rastgo û dilsoz pir girîng in. Hevalê baş ew e ku dema em xeletî bikin, me bi awayekî baş hişyar bike û rêya rast nîşanî me bide.

Muminên hêja!

Dema em gunehêr bikin, divê em bi poşmanî berê xwe bidin Allah, tewbe û îstîxfar bikin û hewl bidin ku careke din heman xeletiyê nekin.

Li şûna ku em ayb û kêmasiyên kesên din bigerin, divê em bi kêmasiyên xwe re mijûl bibin. Pêxemberê me (aleyhissalâtu vesselâm) dibêje:

مَنْ عَيَّرَ أَخَاهُ يَذْنِبُ لَمْ يَمُتْ حَتَّى يَعْمَلَهُ

“Kesê ku birayê xwe yê mumin ji ber gunehê şermezar bike, berî ku ew jî bi heman tiştî were ceribandin, namire.”

Ji ber vê yekê divê em aybên mirovan eşkere nekin. Divê em xerabiyê bi qencyê vegeşînin, li xeletiyên mirovan biborin û pêşî **xwe rast bikin.**

Rabbê me, me ji wan bendeyên xwe bike ku kêmasiyên xwe dibînin, wan rast dîkin û li gorî razîbûna Te dijî. Âmîn.